



Helbestên Xezeblêhatî

Nîzar Qebbanî

Werger
Menaf Osman





Helbestên Xezeblêhatî

*

Nîzar Qebbanî

Werger: Menaf Osman



WEŞANÊN AZAD

Helbest: 01/02

HELBESTÊN XEZEBLÊHATÎ

Nîzar Qebbanî

Navê pirtûkê yê orijînal

عليها مغضوبة اشعار

Wergera ji Erebi

Menaf Osman

Editor

Eslîxan Yildirim

Sererastkirin

Weşanên Azad

Berg û Rûpelsazî

Şener Özmen

Çapa Yekemîn

Weşanên Azad, 2013

Çapxane

İMAJ MATBAACILIK SAN. TİC. LTD. ŞTİ.
Litros Yolu, 2. Matbaacılar Sitesi, C Blok 2 BC 6

Topkapı / İstanbul

Tel: 00 90 212 501 91 40

Sertifika No: 26954

ISBN: 978-0-9575612-1-2

Company No: 8291088

Navnîşan

WEŞANXANEYA AZAD

41 Handa Walk

LONDON

N1 2RF

www.wesanxaneyazad.com

info@wesanenazad.com



Helbestên Xezeblêhatî

*

Nîzar Qebbanî



Nivîskar û helbestvanekî navdar e di dinya Wêjeya Erebi de. Di 21'ê Adara 1923'yan de, li taxa Mî'zenet eş-şehim li Şamê hatiye dinyayê. Di malbateke maldar de mezin bûye. Bavê wî ronakbîr û berxwedanvanek ji berxwedêrên serxwebûn û azadiya Sûriyeyê bû. Dibistana xwe ya seretayî û ya lîseyê di Dibistana Zanînê ya Netewî piştê jî di Fakulteya Hiqûqê de li Şamê xwend. Di sala 1945'an de kete nava kar û bare diplomasiyê de. Li gelek balyozxaneyên welatê xwe bû sefir, li Misir, Tirkiye, Îngilistan, Lubnan, Çîn û Îspanyayê ma. Di sala 1966'an de ji karê diplomasiyê îstifa kir û bi temamî xwe da karê edebî.

Ji sala 1939'an ve dest bi nivîsandina helbestê kir û diwana xwe ya ewilî bi nave *"Esmerê ji min re got ku"* weşand. Di van helbestê xwe de Nîzar Qebbanî bi şikl û naveroka, derket derveyî helbesta Erebi ya klasîk. Ji ber wê yekê jî rastî gelek rexneyan hat ji qîbel klasîkvan û sincparêzan. Lê wî ev xeta xwe di helbesta Erebi de berdewam kir û her ku çû taybetiyên xwe yên resen hîn bêtir derxistin pêş û bû ekolek bi sere xwe di ware helbestê de. Bi piranî di mijara Eşq û şoreşê de nivîsand û li dû hev; *"Sîng û Berên Zarokî"*, *"Samba"*, *"Evîndara Min"*, *"Wênêkêşiya Bi Peyvan"*, *"Nişeyên Li Lênûska Binketînê"*, *"Artist"*, *"Bersivdayînek Hember Dadgehkirina Helbestê"*, *"Helbestên Nerewayî"*, *"Helbestên Xezablêhati"* û gelek pirtûkên din derxistin. Û bi van berhemên xwe bû ekoleke nû di helbesta Erebi ya nûjen de. Di sala 1966'an de, piştî dev ji karê diplomasiyê berda, weşanxaneyek bi nave xwe li Bêrûdê vekir û hemû nivîsên xwe yên siyasî û edebî dane weşandin.

Nûbûna herî mezin di helbesta Erebi de anî rojevê û mecbûr ma ku bi gelek rexneyên tûj re rû bi rû bimîne. Hem ji hêla naverokê ve û hem jî ji hêla teşeyê ve guhertinên kûr di helbesta Erebi de çêkir. Berî her tiştî xwe ji forma klasîk rizgar kir û hemû pîvanên ku dibûne bend li pêşiya herikîn û naweza helbestê danîn kêlekekê û helbesta serbest nivîsand. Bi şeweyekî nûjen û besit ku her xwendevan bikaribe jê fêhm bike şî'r dane hûnandin.

Ji hêla naverokê ve jî, hemû pîvanên klasîk ên ku tenê nîrxên desthilatdariyê esas digirtin dane kêlekekê. Bi giranî mijara eşq, evîn û şoreşê, despotîzma rejîmên Ereban û berxwedana gelê Filistinê û Lubnanê hilda dest xwe û bêsinor nivîsand. Loma bû hedefê rejîmên Erebi û mecbûr ma ku her dem dûrî welatê xwe be. Gava mir jî, li sirgûnê bi hesreta bajarê zaroktiya xwe bi hesreta Şamê mir.

Di sala 1970'yî de bi jîneke Iraqî bi nave Belqîs Er-rawî re ku di balyozxaneyê Iraqê ya li Bêrûdê dixebitî dezewicî. Di sala 1981'ê de gava ku balyozxane hate bombekirin jina wî jî tê de hate kuştin û wî helbestek bi navê *"Belqîs"* nivîsand ku bûbû nadîdeyek ji nadîdeyên sersala bîstan li welatên Ereban.

Nîzar Qebbanî di pêncşema 30'yê Nisana 1998'an de li Londonê çû ser dilovaniya xwe. Dûre naaşê wî anîn Şama ku bi saxiya wî lê qedexê bû. Ji ber ku di wasiyeta xwe de gotibû; *"Min bibin Şamê ji ber ku malzaroka min a ku ez hînî helbestê kirime Şam e!"*

Naverok



- Çawa?, 7
Ji Çûkeke Swisreyî Re, 8
Kulek, 9
Di Lîsta Reş De, 10
Çima Dinivîsim?, 11
Şagirt Di Mala El-Xelîl Ehmed El-Ferahîdî De Asê Dibin, 13
Raporteke Pir Nepenî Ji Welatê Qemistanê, 19
Petrolê Mîna Gurekî Êrişî Ser Me Kir, 35
Ji Rojnivîska Zanê, 39
Hebek Aspirîn, 40
Senfoniya Başûr Ya Pêncemîn, 44
Îmze, 60
Çima Mutab Bin û Taban Di Ezmûna Mafên Mirovan De Bi Bin Ketîye?, 66
Wanek e Wênekêşiyê, 76
Bi Welat Re Di Şûşeya Berandî De, 80
Çûka Dawî Ku Ji Granada Derket, 85
Denklemên Azadiyê Ango Ji Terazîkirina Azadiyê, 94
Partiya Xemgîniyê, 95
Lêxistineke Tenhayî Li Ser Daholê, 96
Sor e... Sor e... Sor e..., 101

Çawa?

Çawa Hogirno?

Çawa dê hozan bikaribe bistire,

Piştî ku lêvên wî bên dirûtin?

Gelo îro helbestkarekî Erebi bimirê,

Kesekî ku li ser nimêjê bike heyê?

Helbesta min, destan ranamûse

Ya rast ew e ku siltan bi xwe ramûse

Destên helbesta min...

Ji Çûkeke Swîsreyî Re

Nivîsandin lanet e hevala min.
De êdî xwe xelas bike,
 Ji dojecha erdheja min...
Min got qey pirtûkên min,
 Stargehên min in
 Dûre min dît ku ew bi xwe ne
 kujerên min
Min got qey wê evîna te,
 Biyaniya min bi dawî bike
 Min dît ku tu mîna avê derbas dibî
 Di nav tiliyên min re...
Min dest bi belavkirina ola evînê kir
Lê belê wan di kêlîkekê de kuştin,
 Hemû bilbilên min...
Li bajarên tozê –Hevala min–
 Tu cudatî nîn e
 Di navbera wêneyê hozanekî
 Û yê simsarekî de...
Xwedêyo: ji her birînekê re
 Qeraxek heye
 Çima yên min bêqerax in?
Hemû penabergeh
Tîna bêrîkirina min naşikînin
Ji ber ku penaberiya min a mezin
Di nava min de ye!

Cenevre, 30.01.1986

Kulek

Gava Şah şûrê zilmê radike
Ez xwe diavêjim şûşa hibrê...
Gava Şah biryara kuştina min dide
Ez di kulekek efsûnê re direvim

Di biniya qesrê re...

Ji bin zilma fir'ewnan
Her gav rêyek xelasiyê heye
Jê re dibêjin 'Helbest'

23.01.1986

Di Lîsta Reş De

Di xaneyê kar
ya pasaporta min de
Hevokeke pir kurt heye
Dibêje 'nivîskar û ozan e'
Destpêkê min digot qey ev hevokek
efsûnî ye
Dê her deriyê li pêşîya min veke
Dê bihêle ku hemû ewlevan,
Hemû leşker û serbaz,
Ji min re têkevin secdeyê
Dê wan serxweş bixe
Lê dûre min dît ku ev hevok
hetika min e
Tawanbariya herî mezin
Û şûrê ku dirêjî stûyê min dibe
Ew bi xwe ye
Her ku ez dertêm rêwîtiyekê...

23.01.1986

Çima Dinivîsim?

Dinivîsim,

Ji ber ku ez diteqim

Û nivîsandin peqandin e...

Dinivîsim,

Bo ku ronahî zora tarîtiyê bibe

Û helbest serkeftin e...

Dinivîsim...

Bo ku simbilên genim

Bo ku dar

min bixwînin

Dinivîsim,

Bo ku gul û stêrk

Çûk û pişik,

Masî û req û beq min fêhm bikin

Dinivîsim...

Bo ku ez cîhanê rizgar bikim

Ji nav diranên Holako

Ji bin serdestiya cerdevanan

ji dînîtiya serokê rêbirkaran...

Dinivîsim,

Bo ku jinan ji bin malikên labîrentên zilaman

Ji bajarên mirinê

Ji pirjintiyê

Û ji bédengiyê xelas bikim...

Dinivîsim,

Bo ku ez peyvan, ji dadgehên lêpîrsînê rizgar bikim

Ji bêhnkirina kûçikan

Ji sêdarên kontrolê...

Dinivîsim,

Bo ku evîndara xwe xelas bikim

Ji bajarên bêhelbest

Bêevîn,
Bajarên ruhsarî û dilşikestinê...
Dinivîsim,
Ji bo ez wê bikim îkonek
Dinivîsim,
Ji bo ku ez wê bikim ewrek
Baranek...
Tişteke nikare me bistirîne ji mirinê
Ji xeynî jinê
û nivîsandinê...

Şagirt Di Mala El-Xelîl Ehmed El-Ferahîdî De Asê Dibin*

Ez dikevim gunehê di helbesta nûdem de
Mîna çûkekî dertêm,
Ji çargoşeyên bîranînan
 Ber bi behrê ve
Dikevim gunehê herî mezin
Yê ku jê re dibêjin ‘Helbestnûsî’
Ez şêweyan ji şêweyên şêweyan dertînim
Dirûvan ji cihên wan dibişkiwînim
 Û kêra xwe
 Di sînga demê de diçikilînim
Ez evîndariyê li ser şêweya xwe dikim
Ne bi dizî
 Bi aşkeratî
 Di bin baranê de
 Li biniya daran
 Li ser kevîran dikim
Ez hemû xêzên sor derbas dikim
Ez dikevim gunehê ‘helbestê’
Ne xema min e,
Kî dibêje ‘ev ji rêderketin e’
 An jî ‘ev kufr e’
 Bila bêje
Ez tu lêborînan ji xelîfeyan naxwazim
An jî ji temendirêjan
Tu niyeta min tune ye
ez beytekî tenê ji derînim
 Ji helbestên xwe
 Ku roja heşrê were...

* El-Xelîl: Zimanzanekî navdar e ji serdemên navîn.

Ez dikevim gunehê helbesta gunehkar
Ez xatir dixwazim ji helbesta naskirî
Êdî ez helbesta afirînkar
A rêbaza nû dinivîsim...
Ez aciz im
Ji hemû tiştên naskirî
Ez evîndarê wê roja
 Ku bêjivan hiltê me
 Ji nav lêvên evîndara min...

Ez hawê zarokan dikim,
Di helbestnameyê de
Ez helbesta kergoşkê
Helbesta xezalê
Helbesta mozê
Helbesta betê
Helbesta tawûsî
Helbesta sincabî
Helbesta şîneheyvê
Helbesta erdhejê dinivîsim
Axê dizivîrînim pinpinîkeke rindik
 Dinyayê jî
 Dizivîrînim pirseke mezin...

Dikevim gunehê helbesta serborî
Zimanê serborî,
 Wêneyê serborî
Ez mîna dînekî bi bazdan
 Li ser rûpelên spî
 Bi helkehelk im...
Ez wê şewqa ku ji bostanê çavan dertê
Vedixwim
 Dikevim nav bêhna gulan
 Nav tirşbûna simaqê,
 Nav avkomka binerdkan
Nav şewata cinetê,
Nav êşa leymûnê...
Ez mirinê dipejirînim
 Li ser du pêsirên serserî
 Ku qanûnê nas nakin!

Ez dikevim gunehê şerabê
Ê balgeha şîn
Û deşdaşa Misrî ya bi neqş
Û guharê Iraqî
 Ku mîna xezalan dibezin
 Li ser gerdena te...
Xirxalên lingan
Û ew bêhna efsûnî
 Ku bi nava min de diçe
 Wekî kêrekê...
Û ew newqa...
Ku mîna rastiyeke xuya dike
 Û mîna xeyalan baz dide
 Ji nav lepên mirov...

Ez qîr dikim
Di bin barana reş de
Ya çavên te dibare
Wekî dînan...
Ji perava helbestên heyî
Ber bi peravên nedîtî ve
Diçim...

Cenevre, 25.01.1986

Raporteke Pir Nepenî Ji Welatê Qemistanê*

–1–

Di nava wan de nemane...
 Ne yêna mîna Ebûbekir
 Ne jî yêna mîna Osman
Tev bûne peykerên mezin
 Li mûzeyê zeman
Siwaran jî hespên xwe firotine
Êdî dewleta qûnekan îlan kirine
Mele û zanyar
 Di malên wan de
 Dane girtin
Bangdan jî dane rakirin...
Bûne pîrek
Hemûyan pêşî mezin kirine
 Xwîn bi nav şeqên wan de diçe
 Meşxûl in bi avisbûnê
 Bi şîrdayînê...
Û pîrekên xwe jî
 Kirine diyarî
 Bo serkirdeyê leşkerên Romê...
Devera ku berê di erdnîgariyê de
Jê re digotin ‘welatê Şamê’
 Êdî bûye ‘Yahûdîstan’
 Ax zemano... ax Xwedêyo... ax...

* **Qemistan:** Navê welatekî farazî ye, jî bo hemû welatên Ereban bi kar tîne. Wateya xwe jî gotî-na zilmê digire.

Di pirtûkên dîrokê de
Ne şûr mane ne jî hesp
Hemû reviyane
Pêlavên xwe hiştine
Pereyên xwe revandine
Zarokên xwe jî li dû xwe hiştine
Û xwe kişandine rawestgehên mirin
Û jibîrkinê
Geh têne kilkirin
Geh têne xemilandin
Geh jî
Mîna şivên xêzeranê
Têne tewandin
Xwe dihejînin
Tu dibê qey Xalid Sûzan e
An jî Meryem Merwan e...
Ax zemano ax... ax Xwedêyo... ax...

Tev mirine
Ji xeynî Lubnan...
Her roj kefenekî din li xwe dike
 Agir bi başûr dixe
Yên din tev
Ketine kunên xwe
 Kêfa xwe dikin
 Bi misk û jin û rihanan
Hemû kedîkirî ne
 Milayim in
 Minafiq in
 Durû ne
 Bizdonek in
Û tenê Lubnan
Şeqaman li Emerîkayê dixe
 Bêtirs...
Agir bi av û deryayê dixe
Lê hezar serkorên Emerîkî jî
 Wê dixin hembêz û paxilan
Gelo mirov dikare bi bênamûsan re
 Lihevhatineke herdemî çêbike?
Ax zemanî ax... ax Xwedêyo... ax...

Gelo hûn dizanin ez kî me?

Hemwelatiyekî Qemistanê me

Ev dewlet ne karê henekan

Ne jî wêneyekî pesndayînê ye...

Xaka Qemistanê

Di ansîklopediya welatan de

Derbas dibe

Hinardeyên wê yên herî navdar

Çenteyên çermîn in

Ew ên ku ji çermên mirovan têne çêkirin.

Ax zemano ax... ax Xwedêyo... ax...

Ka gelo hûn çend gotinan dixwazin
Di der heqê Qemistanê de?
Ya ku ji bakurê Afrikayê dirêj dibe
Heta welatê Neftistanê*
Ya ku ji peravên zilmê
Dirêj dibe
Heta peravên kêferatîyê...
Û şûrê ku datê ser reha dil
Heta bi binê rehê dadikeve...
Şahînşahên wê
Bi werasetê rûdinên
Li ser stûyên gelên xwe
Û çavên zarokan jî
Bi werasetê derdixînin
Benda yekem ji zagona vê dewletê dibêje
Divê ajoyên xwezayî di mirovan de nemînin!
“Qedexe ye Arkadaş, qedexe!!”
Ax zemano ax... ax Xwedêyo... ax...

* Welatê Petrolê.

Gelo hûn dizanin bê ez kî me?
Hemwelatiyekî Qemistanê me
-Çawa min li jor jî got-
Hemwelatiyekî... Xewnê dibîne
 Ku rojekê ji rojan
 Bikaribe bikeve asta ajalan...
Hemwelatiyekî ku ditirse
Li rawestgehekê
 Li çayxaneyekê rûnê
 Da ku dewlet dernekeve
 Di fala fincana wî de...
Hemwelatiyekî ku ditirse
 Nêzikî jina xwe bibe
 Di nava nivîna xwe de lew
 Hêzên 'parastinê'
 Ew der jî binçav kirine
Ez hemwelatiyekî Qemistanê me
Ditirsim derbasî hemû mizgeftan bibim
Da ku neyê gotin 'ev mirov' bawermend e
Da ku sîxurê nepenî nebêje
 'Vî sûreya Er-Rehman xwendî ye'*
Ax zemanî ax... ax Xwedêyo... ax...

* Sûreyeke Qur'anê ye.

Êdî niha hûn dizanin Qemistan çi ye
Ew a ku ji qîbel şêxan ve
 Hatiye nivîsandin
 Hatiye xwendin
 Hatiye afirandin...
Gelo hûn vê dewleta ecêb nas dikin?
Ev a ku derbasbûna avdestxaneyê jî
 Bi hewceyî biryarekê ye
 Ji serkirdarekî...
Dîk jî bi hewceyî biryarekê ye
 Ji bo bangdanê
Xwesteka jin û mêran di anîna zarokan de jî
Bi hewceyî biryarekê ye...
Porê dîlbera min jî
Ji bo ku bi ber bê keve
Bi hewceyî biryareke fermî ye...

Rewş çi qasî xerabe li Qemistanê!
Qemistana ku mêr sûretek ji jinê ye..
Jin jî sûretek ji mêr e..
Qemistana ku di erda wê de
 Tov diqehire ji axê..
Her balindeyek jî ji yên dîtir ditirse..
 Û xwediye biryarê bi xwe jî
 Ji yekî din ditirse
Li Qemistanê wiha ye rewş!
Ax zemanî ax... ax Xwdêyo... ax...

Gelî dostan!
Ez hemwelatîyek im
Li bajarekî bêkesan rûdinim
Bajarekî bêcade ye
Bêpêlik e
Bêşibake ye
Bêdîwar e
Bêrojname ye
Ji xeynî yên ku şah diweşîne
Te got navnîşana wê?
Mixabin!
Ez ditirsim bibêjim
Tiştê ku ez dizanim
Mirovê ku bextê wî wî bine vî bajarê min
Rehma Xwedê lê be!..

Gelî dostan!

Helbest çî ye ku serî hilnede

Helbest çî ye ku zaliman nexîne

Zilmê nerûxîne

Helbest çî ye ku erdhejê çêneke

Helbest çî ye ku taca serê Kesra

Ji serî wî dernexe!

Ji bo vê ez serî radikim
Bi navê wan milyonên ku heta niha
Nizanin bê roj çi ye
Nizanin bê ferqa şaxê ji çûk çi ye
Ferqa gulê ji genim çi ye
Û çi ferqa pêşîran ji hinarê heye
Çi ferqa deryayê ji zindanê heye
Çi ferqa keskahiyê ji qurnefîlê heye
Û çi sînor di navbera mêranî
Û giyotînê de heye?..

Ji bo vê ez raperînê îlan dikim.
Bi navê milyonên însanan
 Ew milyonên ku mîna pez
 Berê wan didin selexaneyê
Bi navê ew ên ku mijangên wan tên kişandin
Ew ên ku diranên wan tên rakirin
 Û di asîdê de tên helandin
 Mina kurmikan...
Bi navê bêdengên
Bi navê bêrayan
Bi navê bêzimanan
Ez raperînê îlan dikim...

Ji ber vê ez serhildanê îlan dikim.
Bi navê wê cemawera
 Ku li ber televîzyonê rûdinê
 Mîna çêlekan
Bi navê wê cemawera ku 'dilsozî'
 Bi kevçiyên pê didin diyarkirin
Bi navê wê cemawera
 Ku lê tê siwarbûn
 Mîna dewaran
 Ji rojhilat hetanî rojava
Û tu maf jî jê re tune ye
 Ji xeynî mafê cehxwarinê
Û tu mafhêvî je re tune
 Ji xeynî ku kurê mîr...
 keça mîr...
 kûçikê mîr...
 Bibe berber...
Bi navê wê cemawerê ku dest li ber Xwedê vedike
Bo 'emirdirêjîyê bide serdarê mezin
 Û baqekî bersîmê...

Gelî dostên helbestê
Ez dara agir im
Ez kahînê bêriyê me
 Û berdevkê fermî
 Yê pêncî milyon aşîqî me
Xelkên evîndar
 Li ser destên min dinivin
Ez carinan wan dikim kevokek
 Carinan jî darên yasemînê...
Gelî hogirên min...
Ez ew birîn im
ya ku her dem red dike
Desthilatdariya kêrê...

Ey dostên min ên hêja!
Ez lêvên bêlêvan im
Ez çavên bêçavan im
Ez pirtûka deryayî ya nexwendî me
Ez nivîsên ku bi hêsirên hatine nivîsandin
Ez wekî vê serdema tewşomewşo
 Ji aqil ne dûr im
 Lê ez
Bi dînîtiyê hember wê derdikevim
 Û bi zaroktî tiştan dihûnim
Di xwîna min de
 Bêhna lîmonê heye
 Bêhna şoreşek Heyfawî...
Ez mîna ku we her gav ez nas kirime
Serxweşê bînpêkirina qanûnê me
 Bi helbestan ez heme
 An jî qet tuneme...

Hogirno

Hevalno

Helbestên rastî hûn in

Qet ne girîng e ku Mîrekê me

Bikene...

An jî biqehire...

Mîrşahê rastî hûn bi xwe ne

Ji we digirim hêza xwe

Ji we digirim rûmeta xwe

Helbestên min qedexe ne

Li bajarên ku li ser xwê û kevîran radikevin.

Helbestên min qedexe ne...

Tên qedexekirin

Ji ber ku ji mirovan re

Bêhna evîn û şaristaniyê tînin

Helbestên min tên redkirin

Ji ber ku mizgîniyê tînin

Ji her malê re...

Ji her kesî re...

Hevalno:

Ez hîna li bendî we me

Da ku em çirûska agir pêxin...

Bêrûd, 15.11.1984

Petrolê Mîna Gurekî Êrîşî Ser Me Kir

Ji derya xwînê... tê ba we
Dilê wî di mista wî de
Xencera şermrakirinê kişandiye
Agirê guhertinê jî di çavên wî de
Kincên Erebitiyê ji ser xwe avêtiye
Dê û bavên xwe jî kuştîye
Di wijdanê xwe de
Hemû mishef dane hêlekê
Bi yekê jî bawer nake
Jê nepirsîn ka çawa
Dîrok di çavan de miriye
Bêrûd
Mîna camtepsiyekê
Ew şikandiye
Êdî li ser mijangên xwe dimeşe
Û ji wê derê tê
Dê biçe ku?
Hemû nexşe winda bûne
Dê li ku bihewe?
Tu stargeh jê re nîn in
Di taxên tevî de
Qureyşiyek tenê jî nîn e
Xwedê destên xwe şûştine
Ji Qureyşîyan...

Petrolê,
Mîna gurekî
Êrîşî ser me kiriye
Me jî bi mirîti
 Xwe avêt ber lingên wê
Me pêwendiyên xwe birîne
Em têgihiştin ku nîrxên têran
 Di gunên wan de ne...
Emerîka qamçiyê xwe
 Li me diceribîne
Mezinê me jî
 Ji guhê wan de dikişîne
Filmên vîdyo difiroşe Ereban...
Cocacolayê jî difiroşe Sîbewê*
Emerîka xweda ye...
Û hezar tirsonekên nav me jî
Li ser çokan e
Hember wê...

* Zimanzanê yekemîn ê ku gramera Erebi daniye, di qirnê nehan de yê mîladî. Bi eslê xwe Faris e.

Ji nava kavilan tê cem we
Mirina wî di çavan de
Kefenê wî jî li ser milê wî ye
Gelo hûn çi helbestan jê dixwazin
Û mîxên bi xwîn hîn çikilandî ne
Di nava destan de
Ey welatên bêmilet
 Şiyar bibin êdî!
 Zalimê xwe jî
 Ji lingan ve bikişînin...
Ey welatên ku bi hovîtiyê hatine îdarekirin
 Heta ku hişê mirovan ket lingên wan...
Gelî mirovan
Dê çawa dengbêj bikaribe bêje
Piştî ku lêvên wî tîrîtin?
 Gelo ku îro hozanekî Erebi bimore
 Kesî ku li ser nimêjekê bike heye?

Ji gule û berikên Bêrûdê...
Heta cem we tê
Ku kêran gurçikên wî parçe parçe kirine
Ala evînê
Ala dadê bilind kiriye
Û şûrê celad jî wî nîşan dide...
Li ba wî
Hemû sêdar
Hemû zindan bûne yek
Helbesta min destan qet ranamûse
Ya rast ew e ku
Şahînşah ramûse destên wê...

Bêrûd, 14.10.1984

Ji Rojnivîska Zanê

Begê min

Ne yaqûtî ji te dixwazim

Ne zêran

Ne ji kincên hevrişim

Hêvîdar im tenê tu min guhdarî bikî

Ji ber ku ez di helbestên xwe de

Hemû naletên Ereban,

Hemû dengên Ereban

Digihînim te...

Axayê min heger tu

Azadiyê nadî helbestên min

Ji şûrkêşê xwe re bibêje

Bila mafê azadiya ewtîniyê bide min...

Hebek Aspîrîn

Na...

Ne ev e ew welatê min î mezin

Na...

Ev ne welatê min e

Ev ê mîna çargoşeyên setrencê parvekîrî

Ev ê mîna mûristanekê

Di biniya nexşeyê de...

Ev ne welatê me ye

Ew ê ku mamosteyê dibistanê

Ji me re rave dikir

Di ciwaniya me de

Na...

Ev welatê ji bîst kantonan

Ji bîst dikanan

Ji bîst seraftan

Berberan...

Û polîsan...

Û daholvanan... û govendvanan

Ne ew welatê min î mezin e...

Na...

Ev welatê ku ji qîbel bîst dînan ve

Tê birêvebirin

Ji qîbel bîst siltanan

Ji qîbel bîst rêberan

Ji qîbel bîst zindankaran ve

Tê birêvebirin

Ne ew welatê min î mezin e

Na...

Ew welatê sadîstan

Ê faşîstan

Ê parsek... û petrolvanan
Ê sofî... û serxweşan
Ê şeytan... û rahîban
Ê feqî û hekîm û meleyan
Ne ew welatê ku di rojên borî de
 Baxçeyê xewnên me bû...
Na...
Ne ev e welatê me...
Ev laşê di bin hikmê sêdarê de
Yê ku bi nexweşiya belharisya ketiye
Yê mîna kûçikan rûniştiye
 Li ber şekala rejîmê
 ziman jî qedexekirî...

Na...
Ne ev e
Ev ê mîna laşekî çarmîxkirî
 Li ser dîwarê xemgîniyan
 Mîna Îsa...

Na...
Ne ev welatê me ye
Ev ê 'emîrquesifî mîna çirçirîkê
Ev ê teng mîna fereke goreyê...

Na..
Ne ev e welatê min î mezin

Na...
Ne ev dînikê seqet e
Ne ev ê cilqetiyayî ye
Ne ev ê bi cizbê ketiye
Ne ev ê binketî ye
Ev ê bi zêr û zibêran

Ev ê bi falan meşxûl e...

Na..

Ne ev welatê min î mezin e

Na...

Ne ev welatê serberjêr e

Ê ku fetisiye di nav gola gotinê de

Ev ê pêxwas î li ser tûncê

Na...

Ne ev zîlamê birîndar e

Ev ê ku her dem di rêya nexweşxaneyê de ye

Ev ê ku di ser kar de tê hîlanîn

Ev ê bêhest û bêwijdan

Na...

Ne ev welatê min î mezin e

Na...

Ne ev zîlamê binketî ye

Ev ê şikestî

Ev ê mîna mişkan tirsonek

Ev ê ku di şûşeya şerabê de

Li rêçeke xelasiyê digere

Na...

Ev ne ew welatê min î mezin e

Welatê min!

Ey windayê di nava cih û demê de

Ê ku di malên Ereban de

Li stargehekê

Li nivînekê digere

Em mezin bûn êdî
Û me nas kir lîstoka fenan...
Welatê ku Selahedîn di ber de mir
 Birçî wî dixwin bi erzanî îro
 Mîna qutiyeke serdînê*
Welatê ku hespan ji bo wî
Stran digotin li Hettînê**
Mirov niha
 Bi hêsanî wî dadîqurtînin
 Mîna hebeke Aspirînê...

08.01.1985

* Teşeyêke konserveyê ye.

** Devera ku artêşa Selahedîn zora xaçperestan bir.

Senfoniya Başûr Ya Pêncemîn

–1–

Min navê te kir Başûr*
Ey ew ê ku di 'eba Huseyn de
 Di roja Kerbelayê de ye!
Ey guldara ku cangorîtiyê
Bi pisporî dike...
Ey şoreşa axê
A ku raserî ya esman hatiye...
Ey bedena ku ji xaka wê genim
 û pêxember dipijiqin...
Destûrê bide me...
Em şûr di destê te de ramûsin!
Destûrê bide me
 Em îbadetê bikin
 Ji wî xwedanê ku ji çavên te dertê...
Ê ku di xwînê de hatiye şûştin
 Mîna guleke sor
Tu yî ê ku belgeya rojbûna me
Daye me...
Ligel guleke azadiyê...

* Meqseda wî başûrê Lubnan e.

Min navê te kir Başûr
Ey heyva xemgîniyê
Ya ku ji çavên Fatîmeyê dertê
Her şev...
Ey keştiya masîvanan
A ku bi pisporî berxwedanê dike...
Ey masiyên deryayê
Ên ku bi pisporî têkoşînê dikin...
Ey pirtûkên şîn
Ên ku bi zanebûn berxwedanê dikin...
Ey beqên çeman
Ên ku bi şev pê de
Ayetên berxwedanê dixwînin...
Ey cezweya qehweya ser komirê
Ey rojên 'eşûreyê
Ey şeraba ava gulan li Seydayê*
Ey minareyên Yezdanî
Ên ku banga berxwedanê dikin
Ey şevbihêrkên folklora gelî
Ey qîreqîra gule û berikan
Di dawetên gelerî de...
Ey tilîliya jinan
Ey rojnameyên dîwaran
Ey tabûrên mûristanan
Yên ku qaçaxçîtiya çekan dikin
Ji bo berxwedanvanan...

* Bajarekî li başûrê Lubnanê.

Min navê te kir Başûr
Ey ew ê ku nimêja sibehê
 Li erda bi mayin dike...
Tu hêvî di Erebên îroyîn de nîn e
Ji xeynî nameyên dilan
 Tiştêk ji wan nayê...
Qet li dû xwe mêze neke
 Seydayê min!
Li paş te
Tenê nezanî û xizanî heye
Li paş te
Tenê herî û pirik heye
Li paş te
Tenê bajarên 'emirqutan heye
 Ên ku tê de dewlemend xizanan dixwin
 Ên ku tê de mezin biçûkan dixwin
 Ên ku tê de rejîm rejîman dixwe...

Min navê te kir Başûr

Min navê te kir

Ew mûma ku li dêran pêdikeve

Min navê te kir hineya tiliyan

Min navê te kir helbesta lehengiyê

Ya ku zarok ji ber dîkin

Di dibistanan de...

Min navê te kir

Pênûs û lînûskên gulînî

Min navê te kir nivîsa nepenî...

Min navê te kir gulên bejndayî

Li sikakên Nabatyayê*

Min navê te kir roja qiyametê

Min navê te kir ew mizgîniya ku kevok

Wê di nav perîkên xwe de hildigirin...

* Bajarekî Filistinê.

Min navê te kir Başûr
Navê te kir av û simbil
 Şitla titûna şervan
 stêrka rojava...
Min navê te kir berbang
 A ku li benda zayînê ye
Min navê te kir şoreş û guhertin
 Paqijî û bawermendî
 “Ezîz û hêzekar...”
Min navê te kir mezin ey gewre!
Min nave te kir Başûr.

Min navê te kir Başûr
Min navê te kir çûkên spî û keştî
 Zarokên ku bi kulîlkan dilîzin
 Civatgirên dora çekan
 Helbesta şînik
 Birqa ku bi agirê wê
 Her tişt dişewite
Min navê te kir demançeya veşartî
 Di bin neynûkên keçan de
Min navê te kir ew miriyên ku piştî definkirinê
Dîsa radibin ser xwe
Ji gorê
Şîv dixwin
Xwe dirêj dikin ser nivînên xwe
Û dilê xwe dixin cî
 Li ser zarokên xwe
 Berî ku dîsa vegerin asîmanan...

Min navê te kir Başûr
Ey ew ê ku mîna giya
 Di lênûska zemên de şîn tê...
Ey rêwiyê kevnar
Ê li ser stirî û êşan dimeşe
Ê di dirûvê stêrkeke bişewq de
 Mîna şûr diçirûsîne...
Heger ne ji te bûya
Em ê hîn ji li ser kufrê bûna
Ne ji te bûya
Me yê aşkera vexwara
 Heşîşa xewnan...
Destûrê bide me
Da ku em şûrê destê te
 Ramûsin...
Bihêle ku em toza ser çaroxên te
 Bidin hev!
Heger tu nehata seydayê min
Em ê li ber lingê serdarê Îbranî
 Serjêkirî bûna
 Wekî miyan...

Ey xwedayê salan û demsalan

Ey şoreşa gelî

Ya ku cêwîyan di zikê xwe de radike...

Min navê te kir: Evîna di hingulîskan de

Min navê te kir: Bêhna di kulîlkan de

Min navê te kir hehecîk

Min navê te kir kevok

Ey serdarên serdaran

Û ey çelengê çelengan...

Derya pirtûkeke şîn e
'Elî nivîsandiye
Meryem jî her şev rûdinê
 Li ser qûmê
 Li benda Mehdî ye
 Gulan diçine
 Ji nava tiliyên kuştiyan
Zeyneb jî çekan vedişêre
 Di bin şalê xwe de
Parçeyên berikan berhev dike
Çekan dibe
 Ji miriyên di neynikan de

–10–

Ji Sûrê tê Fatîme*
Û di cilên wê de
 Bêhna lîmonê heye
Fatîme...
Ber bi min ve tê
Porê wê
Di şêweya vî zemanê dîn de ye
Fatîme tê...
 Û di çavên wê de
 Hespên bi al
 dêmên serhildêr hene...
Gelo şer jî reşika çavan tarîtir dike!?

* Bajarekî Lubnanê ye li qeraxa Deryaya Spî.

Ew ê dîrok rojekê bi bîr bîne
Gundekî biçûk ji gundên Başûr
Jê re dibêjin Mareke
Parast bi sînga xwe
Rûmeta axê
Rûmeta Erebitiyê
Û li dora wê bi sedan
Êlên tirsonek
Û miletekî jihevketî...

–12–

Ji deryaya Seydayê
Pirs dest pê dike
Ji deryaya wê her şev
Al El-beytî dertên
Mîna darên pirteqalan..
Ji deryaya Sûrê... dertê
Xencer û gul û lawij
Jê dertên çeleng...

Min navê te kir Başûr
Min navê te kir naqûs û cejn
 Kenê rojê
 Li ser berdilkên zarokan...
Ey rahîp û hozan û şehîd!
Ey ê ku bi nûjeniyê tije ye!
Ey berika di eniya Eshab El-kehf de!
Ey nebiyê zorê!
Ey ê ku em ji dîlîtiyê xelas kirin!
Ey ê ku em ji tirsê rizgar kirin!

Ey şûrê ku diçirûsine
Di navbera titûn û zilan de!
Ey mihîna ku di beriya xezebê de
Dibeze!..
Herfekê tenê jî ji nivîsên Ereban mexwîne!
Cenga wan qîl û qal e
Şûrên wan textikî
Eşqa wan jî bêbextî ye...
Herfekê tenê jî ji şorên Ereban
Guhdarî meke...
Hemû Nehû û Sarf û Belaxet e*
Hemû zikêşên xewnan e
Bêhnvedankên tepilkan e...
Hewarê di Mazen de nede
Ne Wail, ne jî Texlib**
Di ferhengoka gelan de
Kesekî bi navê Erebnî e!

* Teşeyên wêje û ziman in.

** Mazen, Wail, Texleb: Bavikên Ereban yê navdar in.

Seydayê min
Ey serdarê azadîxwazan
Ji te pê ve kes nemaye
Di vê serdema ketinê de
Di vê dema paşveçûna şoreşgerî de
Paşveçûna qewmî
Paşveçûna ticarî
Paşveçûna ramyarî...
Di zemanê diz û bazirganan de
Di zemanê revê de...
Seydayê min î Başûr
Şor jî bûne ji bo kirîn û firotinê
Gotin jî êdî, bûne reqsvan
Li welatê petrol... û dolaran...
Tu tenê mayî
Tu tenê li ser cam û striyan dimeşî
Birayên te yên hêja jî
Li ser hêkan razane
Mîna mirîşkan kurk ketine
Di dema cengê de...

Ey seydayê min î Başûr
Li bajarên xewê
 Ku toz û jana zirav lê dimîne
Li bajarên mirinê
 Ku baran ditirse rêya xwe pê bixe
Tu tenê mayî...
 Di jiyana me de
 Darên xurmeyan diçînî
 Darên tirî
 Û heyvan diçînî...
Tu tenê...
Tu tenê...
Tenê mayî...
De êdî deriyekî rojê
 Li me veke...

Bêrûd, 10.03.1985

Îmze

-1-

Li navendeke ewlekariyê
Li welatekî bi şûnde mayî
Li ber bendeke lêgerînê
 Ez rawestiyam...
Tiştêk bi min re tunebû
 Ji xeynî xemgîniyê
Welatê min
Çend gav bi şûn de bû
Dilê min jî dilîst
 Di nav parxanê min de
 Mîna kevokeke bi hesreta avê
Pasaporta min di destê min de
 Xewnên xaka zaroktiya min didît
Ew xaka ku genimê xwe
 Behîvên xwe
 Hêjîrên xwe dabûn min
 Û bi noşîcanî ez şîr dabûm...

Di rêzê de sekinîm
Li welatê xwe
Ne li Kongoyê
Ne jî li Tanzanyayê
Rojê xakî li xwe fikir
Daran xakî li xwe fikir
Gulan jî kincên belek li xwe dikirin...
Tirs li pêşiya me bû
Serbazekî pêncstêrkî
Tije kîn
Em li dû xwe dikişandin
Mîna pez...
Ji roja Kabîl heta roja îroyîn
Her gav kujerekî pîspor hebûye
Û gelekî ku tê gurandin
Mîna pez...

Li navenda azar û êşkenceyê
 Ku roj li wê derê nagere...
 Ku dem li wê derê derbas nabe...
 Ku ji qalik û rehan pê ve
 Tiştêk ji mirov namîne...
Xêzeke sor dirêj dibû...
 Di navbera du Berlînan de
 Di navbera du Bêrûdan de
Du Senayan
 Du rojnameyan
 Du êlan
 Du mezheban
 Du devokan
 Du taxan
 Du nîşanekên trafikê de...
Tirs mîrekê demsalan bû
Erdê baran ji Îlonê pars dikir
Me jî 'emirê derbasbûnê
 Ê Hûmayyûnî
Wax bavo!! Wax dayê!!
Gelo her ku gelek ji gelên Asyayê
Serxwebûna xwe bistîne
 Dê 'lehengên' wî gelî serjê bikin
 Mîna dewaran?

Ez li ku me?
Delîl hemû dibêjin
'Ev der Erebiya' ye
Hemû sixêfên ku em dibihîsin
Maleke kevn e ji berhemên 'Erebiya'yê
Hemû rêç û rêbaz
Diçin ber şûrê zilmkaran...
Ez li ku me?
Di her navberka du cadeyan de
Welatek çêbûye...
Her di navbera du dîwaran de
Welatek çêbûye...
Her di navbera du darên xurmeyan de
Welatek çêbûye...
Xwedêyooooo!!!
Ey wênekêşê asoyan!
Û ey endezyarê asîmanan!
Gelo bi rastî jî ew qulika hûrik
Welatê min e?

Li navenda dînîtiyê
Kuxikê
Serêş û belhariyayê...
Ez mehekê sax sekinîm
Salekê sax rawestiyam
Li ber deriyê serokê mafyayê
Min îzna derbasbûnê
Jê pars fikir
Min mala zaroktiya xwe
Gul û reyhan û beybûnên xwe
Jê pars fikirin
Odeya xwe
Hibr û pêûs û tebeşîrê xwe...
Ez di devê tivinga Rûsî de
Min bi xwe re digot
‘Wey bavo ev çi ye?
Qey Xwedê jî bûye serokekî mafyayê!’

Li navendeke tirsê

Yeke bênav

Ku van rojan mîna kuvarkan

Li her derê welat belav bûne

Ez temenekî sax sekinîm

Gava ku ez bûm kalekî heftêsalî

Û îzna derbasbûnê dane min jî

Êdî di erdnîgariyê de

Navê welatê min nemabû

Welatê min nîn e!..

Êdî di erdnîgariyê de nîn e...

Êdî di erdnîgariyê de nîn e...

Çima Mutab Bin û Taban Di Ezmûna Mafên Mirovan De Bi Bin Ketîye?*

–1–

Hemwelatîyên bêwelat in em
Mîna çûkan tèn qewirandin
Ji nexşên zemên
Rêwîyên bêkefen in
Hakim jî me difiroşin
Em bêjiyên serdemê ne...
Bihayê me jî ew distînin!
Em carîyeyên qesrê ne
Me dişînin çep û rast
Ji odeyekê ber bi yeke din ve
Ji destekî ber bi destekî din ve
Mîna kûçikan em dibezin
Her şev
Ji Aden hetanî Tanca
Ji Tancayê hetanî Aden
Em li êlekê digerin
Ku me bihewîne...
Li stargehekê digerin
Ku me bistirînin...
Û xaniyekî...

* ‘Mutab Bin û Taban’ Bi wateya; westî, kurê westiyayî ku navê navdarekî Ereban yê kevn e.

Zarokên me li dora me ne
Pişta wan xûz bûye
Hîna jî di ferhengokên kevnare de digerin
li bihuşteke
Li devereke mezin
Deverek pir mezin
Ku jê re dibêjin ‘welat’...

Em hemwelatiyên bajarê girî ne
Qehweya me ji xwîna Kerbelayê ye
Hevîrê me bi goştê Kerbelayê stirayî ye
Xwarin û vexwarina me
Adet û alên me
Rojî û nimêja me
Gul û gorên me
Çermên me
Hemû mohrkirî ne
 Bi mohra Kerbelayê yê...
Kes me nas nake li vê çolterê
Ne dareke xurmeyê me nas dike
Ne stûnek
Ne kevirek
Ne Hind ne jî Afra*
Kaxizên me balkêş in
Ramanên me biyan in...
Ne petrolxur me nas dikin
Ne êşvexur
Ne jî hêsirvexur...

* **Hind û Afra:** Du karakterên jin yên xweşik di wêjeya Erebi ya kevn de.

Em girtî ne...
Di pirtûkên ku serdarê me
Dinivîse de
Em girtî ne...
Di olşirovekirina melayê xwe de
Em girtî ne...
Di xemgîniyên xwe de
Û tiştê xweşik di me de
Xemgîniyên me ne...
Em di bin çavan de ne...
Di qehwexaneyan de...
Di malan de...
Û di zikê diya xwe de
Em bi ku ve herin
Sîxurê nepenî li benda me ye
Ji qehweya me vedixwe
Di nivîna me de radikeve
Bi nameyên me dilîze
Ewraqên me li hev dixê
Dikeve pozê me
Di kuxika me re dertê
Zimanê me hatiye birîn
Serê me hatiye jêkirin...
Û nanê me şolî bûye
Bi ava tirsê
Bi hêsiyan

Gava em xwe diavêjin bextê parêzvanên êlê
Dibêjin qedexe ye...
Ku em xwe diavêjin bextê xwedayê asîmanan
Dibêjin qedexe ye...
Ku em bang dîkin ‘Resûlê Xwedê alî me bike!’
Îzneke bêveger didine me...
Ku em pênûsekê bixwazin
Da ku em helbesta xwe ya dawî
Pê binivîsinin
Berî darvekirinê
Mijarê diguherînin...

Ey welatê min î çarmîxkirî
Li ser dîwarê kînê...
Ey goga agirî
Ku berjêr digindire
 Ne ji Benî Mûdar
 Ne jî ji Benî Thakîf*
 Kes tiştêkî xwe nade te
Kes ne şûşeyek xwîna xwe
Ne jî şûşeyek mîza xwe ya tahir
Nade vî welatê birîndar...
Tu kes... Li ser seranserê vê 'ebaya pînekirî
Rojekê
Ne kumekî
Ne çakêtekî diyarî wî nake...
Ey welatê min î şikestî
 Mîna giyayê payîzî
Em mîna darên ji cihê xwe rakirî bin
Qewirandî ne
 Ji biranîn û hêviyên xwe

* Bavikên Ereban in.

Çavên me
Ji mijankên me ditirsin
Lêvên me
Ji dengê me ditirsin
Serkêşên me xweda ne
Xwîna şîn di rehên wan de ye
Em jî dola navmaliyê ne
Ne mezinên Hicazê me nas dikin
Ne şivanên çolterê
Ne Ebû-Tayip* me bi mêvantî qebûl dike
Ne jî Ebû-Atahiye**
Ku em carekê bi 'Elî re bikenin
Mûawiye me dikuje...

* **Ebû-Tayip:** Comerde herî mezin di dîroka Ereban de, di sedsala heştan de jiyaye.

** **Ebû-Atahiye:** Şa'îrekî navdar ji qirnê yazdehan.

Em mihacirên bênderên westiyayî ne
Tu kes me naxwaze
Ji behra Bêrûdê... heta derya Ereban...
Ne Fatimî ne Qermetî...
Ne Memlûkî ne Bermekî
Ne şeytan ne jî ferîşte
Tu kes me naxwaze
Li bajarên ku petrolê bi jinan
Ser bi ser didin...
Cîwaran bi dolaran
Mîratan bi sicadeyan
Dîrokê bi temtelikan
Mirovan bi zêran didin
Gelê wê jî
pelên daran dixwin

Tu kes me naxwaze...
 Li bajarên faîzdar û sîmsaran
 Hosteyên hikm û maldaran
 Û rewşenbîrên fermî
 Û helbestvanên kirêkirî
 Û qeşirandinvanê mûz û sêvan
 Bo qralan
 Û pêşwazîkarên listeyên xweşikjinan
 Bo mîr û began
 Gava ku xwe dirêj dîkin
 Li ser nivîna xwe...
 Û karmendên qesra seksê
 Û qeşmer
 Û mirovên xesandî
 Û yên ku heta kabokê di xwîna me de ne
 Tu kes me naxwîne
 Li bajarê xwê
 Ku her sal bi hezaran
 Pirtûkan serjê dîkin...
 Tu kes me naxwîne
 Li bajarên ku saloxkarên dewletê
 Tê de bûne şîrovekarê wêjeyê

Em rêwî ne
Di keştiya xemgîniyê de
Serdarê me bêjî ye
Şêxê me rêbir e...
Em di qefesan de komkirî ne
Mîna cerdonan...
Ne benderek me qebûl dike
Ne qehwexaneyek
Ne jî jinek...
Pasaportên me tev
 Ji destê şeytên derketine
Hemû nivîsên me naecibîne
 Şeytanê me
Em rêwî ne
Di derveyî cih û demê de
Em rêwiyên ku diravên xwe winda kirine
Kel û pelên xwe
Zarokên xwe winda kirine...
Ne Benû-Haşim me nas dikin
Ne jî Benû-Şeyban...
Ne Benû-Lenîn me nas dikin
Ne jî Benû-Regan...
Welato:
Hemû çûk xwedî mal in
 Ji xeynî çûkên azadîxwaz
Ew tenê dûrî welatên xwe dimirin...

Cenevre, Kanûn-1985

Wanek e Wênêkêşiyê

–1–

Kurê min
Qutîka rengan datanî ber min
Ji min dixwest ku ez wêneyê çûkekî
Jê re çêbikim
Min firçe di rengê gewr dadikir
Çargoşekê bi xilq
Û çend şîşên hesinî jê re çêdikirin
Kurê min behetî dima û digot:
'Ev zindan e babo...
Qey tu nizanî çûçîkekî çêbikî?'
Min jê re digot
Li min megire kurê min
Min hemû çûk ji bîr kirine...

Kurê min

Qutîka rengan li ber min datanî

Ji min dixwest ku ez deryayekê çêbikim

Min pê nûs digirt dest xwe

Û jê re giloverikek reş çêdikir

‘Lê ev giloverikek reş e babo?!...’

Qey tu nizanî deryayekê çêbikî?’

Min jê re digot kurê min

Di dema xwe de ez jêhatî bûm

Di çêkirina deryayê de

Lê îro

Şewka min ji min standine

Qeyîka min a nêçîran masiyên azadiyê jî...

Kurê min lînûska wênêkêşiyê
Datanî ber min
Û ji min dixwest ku ez
Simbilekî genim jê re çêbikim...
Min pê nûs digirt dest xwe
Jê re demançeyek çêdikir...
Kurê min bi nezaniya min dikeniya
Bi şaşwazî ji min re digot
'Qey tu nizani babo
Ferqa navbera simbil û demançeyê?'
Min jê re digot kurê min
Berê min baş zanibû teşeyên simbilan
Teşeyên nan...
Teşeyên gulan...
Lê belê li vê dema metalîk
A ku darên daristanê jî tê de
Tev li cerdevanan bûne...
A ku gul jî tê de
Cilên belek li xwe kirine...
Di vî zemanê simbilên çekdar
Balindên çekdar
Çanda çekdar de
Di çi nanê ku ez dikirim de
Îlehî demançeyek tê de dertê
Çi gula ku ez biçînim jî
Îlehî çeka xwe li min dikişîne
Çi pirtûka ku ez bikirim
Îlehî di nav tiliyên min de diteqe...

Kurê min li kêleka nivîna min rûdinişt

Û dixwest ku ez helbestekê

Jê re bixwînim

Hêsireke min digindirî ser balîfê

Kurê min bi tirs ew digirte destê xwe

Û digot

‘Lê ev hêsireke bavo ne helbest e!?’

Min jê re digot kurê min

Gava ku tu mezin bibî

Tu dê bibînî

Tu dê hîn bibî ku hêsir û helbest, xwişk û bira ne...

Û Helbesta Erebi jî

Jixwe rondikek e

Ji nav tiliyan dertê...

Kurê min pê nûs û rengên xwe

Li ber min datanîn

Û dixwest ku ez welatekî jê re çêkim...

Firçe di destê min de dihejiya

Û di cî de ez li erdê diketim...

Bi Welat Re Di Şûşeya Berandî De

Gava ez bêriya welat dikim
 Wî bi xwe re dibim bîraxaneyê
 Datînim ser maseyê
 Û vedixwim hetanî berbangê...
Pê re diaxivim
Di nava şûşeya vala de vedikevim
Di dawiya şevê de...
 Ew bi xwe li xwe mikur tê
 Ku ew jî bêwelat e...
Destmala xwe dertînim
 Hêsirên xwe paqij dikim...

Şûşeya 1^ê

Gava ez şûşeya yekê vedixwim
Ez welatî mîna hêsiyê kesê çêdikim
Kincên xwe di ser xwe re tînim
Û xwe tê de dişom...

Şûşeya 2'yan

Gava ez şûşeya duduyan vedixwim
Ez welatî di şiklê zindanekê de çêdikim
Û xwe jî
Li ser sînga wê dixeniqînîm...

Şûşeya 3'yan

Gava ez şûşeya sisêyan vedixwim
Ez welatî di şiklê zindanekê de çêdikim
 Û cezayê helbestê
 Yê bêdawî yî giran
 Tê de dikişînim...

Şûşeya 4'an

Gava ez şûşeya çaran vedixwim

Û şûşe ji ser hişê xwe diçe

Ez welatî di şiklê sêdarekê de çêdikim...

Helbestên min pê ve dadileqin

Di nava merasîmeke gewre de

Ku Serdarê mezin jî li wir e

Û tajiye wî

Û şêwirmendê wî

Û serokê saziya zindanan

Û serokê saziya definkirina mirovan

Û wezîrê perwerdeya bilind

Û serokê yekîtiya nivîskaran

Û serokê keşeyan

Û sergaziye welat

Û hemû wezîrên dewletê

Ên ku bi lez hatibûn tayînkirin

Da ku hozan bikujin

Û di cenazeya wî de bimeşin...

Çûka Dawî Ku Ji Granada Derket

–1–

Her du çavên te
Du keştîrêwiyên dawî ne
Gelo cî ji min re jî heye?
Ez betilîm êdî
Ji gera li van îstasyonên dînîtiyê
 Ku ez negihandim tu cihan...
Her du çavên te
Pêmayên ji stêrkên havînî ne
Tiştên mayî ji heşîşa deryayê ne
Tiştên mayî ji zewiyên titûnê ne...
Her du çavên te
Daweta gelêrî ya dawî ne
Mihricana dawî ne...

Her du çavên te...
Pêmayek ji çanda eşqê ne
Tiştên mayî ji nameyên evînê ne
Her du destên te...
Her du lênûskên hevrişimê yên dawî ne.
Li ser wan min dinivîsand
Gotinên herî xweş...
Evîn min disoje
Mîna şîşeke hesinî
Û ez nahelim...
Helbest ji min birîndar dike
Bi xencera xwe
Û ez tobeyê qebûl nakim
Ez ji te hez dikim
Ey ew a ku xelkên başûr
Di çavên xwe de hiltîne...
Bi min re bimîn da ku derya
Şîneya xwe biparêze
Û xox ji tama xwe
Û rûçikê Fatîma ji bimîne mîna kevokekê
Di bin şewqa rojavayê de
Bi min re bimîne...
Belkî Huseyn ji were
Di 'ebaya wî de kevok
Û keştî û xweşahî hene
Li pişt wî dimeşin
Minare û bender
Û hemû şoreşgerên başûr...

Her du çavên te...

Du peravên helbestvaniyê yên dawî ne...

Û firtoneyê ez çirçirandime

Min got belkî helbest min xelas bike

Lê belê wan ez bi nav kirim

Min got belkî evîn min bîne serhev

Lê belê jinan ez parçe parçe kirim...

Dildara min

Şaşwazî ye ku îşev ez li jinekê rast bêm

Qebûl bike ku bi min re heval be

Û min bişo di barana evîna xwe de

Şaşwazî ye

Ku hîna helbest heyê

Û derbas dibe

Di nava rivîn û dûmanê re

Şaşwazî ye ku hîna nivîsandin heyê

Tevî bêhnkirina kûçikan

Tevî binerdkên zordariyê

Hîna jî çavkaniyeke

Hêzê ye...

Av di çavên te de zerikî ye
Gewrikî ye...
Xemrî ye...
Bavanên min ron dikan
 Û ez li ser piştê keştiyê
 Mîna çûkekî sêwî me
 Tiştêkî nafikirim
 Ji vegerê pê ve...

Bêrûdê
 Jinebiya Ereban
 A bendan
 A êlan
 A cîneyet û dînîtiyê

Bêrûdê
 Di ser nivîna dawetê de
 Tê serjêkirin
 Û xelk li dorê temaşe dikan

Bêrûdê...
Xwînê dirijîne di rê de
 Mîna mirîşkekê
Ka aşiq bi ku ve reviyên?
Bêrûdê li rastiya xwe digere
Li êla xwe digere
Li mirovên xwe digere
Lê belê hemû minafiq in...

Her du çavên te...
Rêwîtiyeke şevê ya dawî ye
Çenteyên min li erdê ne
Li benda firînê ne
Dar jî kelogirî xwe diavêjin
 Ber lingên min
 Da ku ez wan bi xwe re bibim...
We dîtiye ku tu dar di revê de fikirîne?
Ev e ew zemanê xwînî
Ew zemanê mirazî
Ew ê hetikê
 Ê ku xemilandî ye
 Bi bêbextî û gunehan...
Ev e ew zemanê ku çand
Û nivîsandin
Û rûmet
Û ciwanmêrî
 Tê de diçe ava...
Êdî mirov çawa dê bikaribe
 Derbasî helbestê bibe?
Û lênûskên min
 Tije qulik in...
Petrol
Bi kêfxweşî xwe dirêj dike
 Li bin darên xewê
 Û di nava pêsîran de...
Ev e ê ku ji me re anî
 Kincên şeytanekî melûn...
Petrol ew avika herikbar
Ne a Erebi
Ne a gelî
Ew kergoşka revok

Di hemû şeran de...

Petrol

Vexwarina padişahên mezin e

Ne ya xizanên reben e

Ne vexwarina gelan e...

Ez ê çawa derbasî helbestê bibim gelo?

Ez ê çawa derbasî wê bibim

Û petrol dikire

Hezar cihseyranên li ‘Marbiya’..

Nîvê Parîsê

Û nîvê rok û laşên li Nîsê

Hezar yextên li deryaya Xwedê

Û hezar stranbêjên qûnek

Lê belê nikare şûrekî tenê bikire

Ji bo rizgarkirina Başûr...

Her du çavên te...
Ji bermayên şitlên xurman e
 Di welatê min î xemgîn de
Evîna te...
 Şoreşek spî ye
 Ji hezarên salan ve îlan bûye...
Bi min re be
Bi min re jinek be
Ku rûçikê wê vedişêre
 Rûçikê sibê...
Bi min re helbestek be
Ku her dem dijber e
 Ji bayê rêwîtiyê re...
Bi min re qereçiyek be
Erebek be
Hevokek be...
Bi min re cinek be
Dildar nagihîjin lûtkeya eşqê
 Ku nekevin nav refên qehrokan...
Evîndara min
 Ez diyar dikim
 Ku hemû tirî
 Û hêjîrên li ser rûyê erdê
 Mafên hejaran in...
Hemû helbest û nivîs...
Hemû kilên di çavan de...
Hemû cewherên di sîng û beran de
Hemû giya
Hemû yasemîn jî
 Mafên xewnekêşan e...
Bi min re be!
Ez nabêjim ku roj Xwedê ye

Li hember rûçikê te
Bi giloveriya xwe...
Bi qelaq ez diyar dikim
Helbest ji hemû serdaran
Bihêztir e...

Bêrûd, 21.10.2004

Denklemên Azadiyê Ango Ji Terazîkirina Azadiyê

Heger ji bo firînê
Her çûkek
Bi hewceyî îzna wezareta hundirîn be...
Heger
Her masiyek
Bi hewceyî îzna derketinê be
Ji bo ku bi rê keve...
Dê koka çûk û masiyan ziwa bibe!..

Partiya Xemgîniyê

Heger welat bi xwe jî
Mîna min sirgûnbûyî be...
Mîna min
Di çarşefên diya xwe ya spî de
Di reşpisîka malê de
 Bifikire...
Heger welat jî mîna min
Rêya nivîsînê lê qedexekirî be...
Rêya çandê lê qedexekirî be...
Çima ew jî mîna min naçe nexweşxaneyê?
Çima ew jî mîna min
Nabe endamê partiya xemgîniyê
 A ku sed milyon Ereb tê de ye...

Lêxistineke Tenhayî Li Ser Daholê

–1–

Serdar li daholê dide
Hemû wezaretên ragihandinê jî
Li heman daholê didin...
Hemû ajansên nûçeyan jî
Olana deng mezintir dikan
Rojnameyên biçûk...
Tev bi reqsyanî dixebitin
 Di karên dewletê de...
Di mûsîqayê de
Tu deng
Ji yê dewletê pîstir nîn e!!

Mûsîqa fermî
Li ser ereboka tê firotin
Mîna serdînan*
Mîna nan
Mîna çayê
Mîna hebên bergirtina hemlê
Mîna parçeguherînên tirimbêlan
Derewên fermî
Li ser hemû pêlan têne weşandin
Şorên rêveberiyê pir biroqankî ne
Mîna kincên reqsvanan
Ji rêçeteyên hikumetê
Tu kes xelas nabe...
Sê kevçî berî xwarinê...
Sê kevçî piştî xwarinê...
Sê kevçî berî nimêja nîvro...
Sê kevçî piştî nimêja esir...
Sê kevçî berî merasîmên defnê...
Sisê jî berî mirinê...
Tu zilm di dîrokê de
Mîna vê heye?
Dahol mêjî ji hev belav dike
De ka Xwedêyo sebrê bide me!!

* Teşeyê koserveyê ye.

Dewlet baş dizane axaftinê
Dizane wezn û pîvan û sazkirinê
Dizane pesindanê
Tu helbest ji ya dewletê
 Xerabtir nîn e!!
Tu derew ji ya dewletê zîrektir nîn e
Rojname, nûçe, şîrove...
Kasketên biroqankî li ser milan
 Û tivingên derewberkavêj
Welatekî bidarvekirî
 Li ser têtên antênan
Welatekî ku hîna marşên serkeftinê dixwîne
 Li ser miriyan

Dewlet di serdema nû de
Dengsaziya daholê eyar dike:
‘Dad bingeha milk e’
‘Şêwra nav gel bingeha milk e’
‘Gel mîna ku tê rêzkirin bingeha milk e’
Ey xwedayê cîhanê
Em têr bûn ji dengê daholê
Kes xwe nahejîne li ber gotinan
Ji xeynî dewletê...
Kes zînayê bi gotinan re nake
Ji xeynî dewletê...
‘Tepisandin, bingeha milk e’
‘Bidarvekirina mirovan, bingeha milk e’
‘Serdestiya polis, bingeha milk e’
‘Xwedawendiya kesan, bingeha milk e’
‘Hilbijartina hikumdarên, bingeha milk e’
‘Lêxistina gotinan li xazûqê jî
Bingeha milk e.’
Dahol... dahol...
Hikumdar hunerên xwe
Rindbûna xwe diyar dike
Li sûka komfirotinê...
Tu tazîbûn ji ya dewletê pîstir nîn e...
Dahol... dahol...
Welatekî Ereban e
Ku ji roja ewil heta niha
Hatiye ser hev bi daholekê
Û bi daholekê ji hev belav dibin êlên wî...
Endamên koroyê
Û zanyar
Û xwedan raman
Û xwedan îman

Û qaziyê bajêr
Hemû dihejin
 li ser rîtma daholê...
Melodiya fermî
 A petrolî
Dike ku mirovan bifiroşe
Bermîlek ji mirovekî bihatir e...
Mûsîqa fermî tê dubarekirin
 Mîna strana şeytên
Ku siltan bistrê
Divê em tev xwe bihejinin
Û bibe ‘ah’ û ‘wahên me
 Li ber polîsan
Ah... ah...
Ah... û ah...
Melodiyên bi zorê
Kêfeke bi zorê
Mirineke bi zorê
Ah... ah...
Qey stranên serdaran jî pîroz bûne
Mîna stranên Xwedê..?

Cenevre, 12.02.1986

Sor e... Sor e... Sor e...

–1–

Qet mefikir

Şewq sor e...

Bi kesî re mepeyiv

Şewq sor e...

Hewl nede di nîqaşa nivîsên olî de

An ên di gramerê de

An di ên belaxetê de

An di ên helbest û pîşeyê de...

Aqil melûn e ne baş e...

Jê dûr keve..!

Dernekeve

Ji koxika xwe ya morkirî bi mûmê

Şewq sor e...

Ji jinekê hez neke

An jî ji mişkekê

Şewq sor e...

Tu carî neraperike

Ne bi dîwarekî ve

Ne bi kevirekî ve

Ne jî bi kulavekî re

Şewqa seksê sor e...

Bimîne nepenî

Winda

Biryarên xwe jî aşkera neke

Ji tu kesî re...

Bimîne nexwendî...

Nebe şîrikê zînayê

Ne jî yê nivîsandinê

Di vê demsala me de

Gunehê zînayê siviktir e

Ji gunehê nivîsandinê....

Di çûkên welat de nefikire
Ne di dar û çeman de
Û ne jî di nûçeyên welat de
Nefikire
Di wan ên ku roja welat
 Binpê kirine
 Da ku şûrê zilmê
 Bi tava sibê re neyê ser te
Di nivîsandinên rojnameyê de
Di pîvanên helbestê de
Û di pêmaya qehweya te de
Di hembêza jina xwe de
 Ramekev!
Serlêndankarên te yên berbangê
 Di bin qenepeya te de ne

Pirtûkên rexnekirin û felsefeyê

Mexwîne!

Serlêdankarên te

Mîna kêçan belav bûne

Di nav hemû refikên pirtûkxaneyê de

Bimîne di bermîla xwe ya tije mûristan

Û kêç...

Û di gemar de...

Bimîne darvekirî ji lingên xwe

Heta roja qiyametê...

Bimîne devvekirî ji dengê xwe

Heta roja mehşerê...

Bimîne daleqandî ji hişê xwe ve

Heta roja berxetê...

Bimîne di bermîlê de

Da ku tu nebînî

Rûçikê vî gelê bindest...

Ku tu hewl bidî

Biçî cem siltan

An cem jina wî

An jî cem zavê wî

Ê ku ji welat berpirsyar e

Ê ku masiyan... û sêvan... û zarokan dixwe...

Tu yê bibînî ku şewq sor e...

Ku rojekê tu bixwazî
Raportekê li ser rewşa hewayê
 An jî li ser navê masiyan
 Û nûçeyên cerîmetan bixwînî
Tu yê bibînî ku şewq sor e...
Ku tu hewl bidî
Li bihayê dermanê astimê bipirsî
 An bihayê pêlavên zarokan
 An jî bihayê bacanan
 Tu yê bibînî ku şewq sor e...
Ku tu rojekê hewl bidî
Rûpela remildankê bixwînî
 Da ku tu şansê xwe binasî
 Berî petrolê
 û piştî petrolê...
An ku tu mirina xwe
 Di nav tabûra ajalan de binasî
 Tu yê bibînî ku şewq sor e...

Ku tu hewl bidî ji xwe re
Maleke kartonî bibînî
Da ku tê de bisitirî
An xanimêkê ji bermahiyên şer
Û du pêşîrên çilmisî
An jî sarinceke kevnare
Da ku sebra te bînin
Tê bibînî ku şewq sor e...
Ku tu hewl bidî
Pirsekê ji mamosteyê xwe bikî
Bê çima Ereb
Sebra xwe bi nûçeyên binketinan tînin
Û çima Erebên îroyîn
Mîna cameke şikestî li ser hev in
Tu yê bibînî ku şewq sor e...

Rêwîtiyê meke
Bi pasporteke Erebi
Careke din meçe Ewrûpayê
Ewrûpa mîna ku tu jî dizanî
Pir bêhteng bûye
 Ji hemû ehmeqan...
Ey gur
Ey bêaqilê ku ji hemû nexşan hatiye qewirandin!
Ey dîkê serjêkirî
Ey kuştîyê bêşermirî
Ey serjêkiriye bêxwîn...
 Neçe welatê Xwedê
Xwedê jî razî nabe
Ku raserî bizdonekan bê

Bi pasporteke Erebi megere!

Mîna mişkan xwe ramegire

Li balefirqehan...

Şewq sor e...

Bi zimanekî fesîh nebêje

‘Ez Merwan im’

‘Ez Adnan im’

An jî ‘Ez Suphan im’

Ji firoşkara zerik re

li Harodze

Ji ber ku ev nav jê re bêwate ne

Û diroka te jî -begê min-

Dirokeke qelp e

Pesnê mêraniya xwe nede

Li Elîdeyê...

Ji ber ku ne Suzan

Ne Canîn...

Ne Kollet..

Û ne jî bi hezaran jinên Frensî

Tu carî çîrokên Zîr û Enter nexwendine

Tu pir şerpeze yî di şevên Parîsê de

Zû vegere otêla xwe

Şewq sor e...

Bi pasporteke Erebi neçe
 Nav taxeke Ereban
Ji bo temtelîkekî ew ê te bikujin
Dê te bixwin
 Ku êvarekê birçî bibin
Nebe mêvanê Hatem El-Taî
Ew derewînekî dizik e
Ne cariyên wê yên pir
Ne jî sindoqên wî yên zêran hene
Bela te nexapîne...

–12–

Hogirê min
Bi şevê tenê nemeşe
 Di nava diranên Ereban de
Li mala xwe jî
Tu di bin çavan de yî
Tu di nava gelê xwe de bênesîb î
Hogirê min
Rehma Xwedê li Ereban be!!!

25 Îlon 2004